zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



Sal:1986

www.arsivakurdi.org



ZAROK FÊKIYÊN MALAN E

Nama xwendevanekî

Brayên hêja û delal,xwediyê kovara zarokên Kurd yên şagirt,
Gelek silavên şoreşgerî ji we re rê dikim. Ez gelekî kêfxweş bûm dema kovara zarokên Kurda"Kulîlk" kete destê min.Ez bi vê nama xwe hêvî dikim,ku hûn vê xebata xwe ya hêja berdewam bikin û tim û tim pêşde biçin.

Hevalno,min xwest,ku ez bi vê nama xwe gelekî kêfa xwe ji we re bînim.Ez dixwazim ku hûn carê çend hejmaran li ser navnîşana min bi rê kin.

Daxwaz û armanca min eve,ku ez bi Kulîlkê xwîşk û brayên xwe fêrî zimanê wan yê zikmakî bikim û wan di warê zimên de xurt bikim.

Ez cardin gelek silavên xwe ji we re bi rê dikim.

Hevalê we

ŞÊRZAD/Kurdistan







www.arsivakurdi.org

PERWAN Û GUL
YARÊN JI DIL



PERWAN:
Ez perwanê bask belek
Hej te dikim pir gelek
Lê lê gulê g-la min

GUL:
Lo perwano perwano
Li te birengo ciwano
Tim ji gulê re mêvano



PERWAN:
Têm mêvanê gula xwe
Ku em xweşkin jîna xwe
Erê gulê yara min

GUL:
Lo perwano ez gul im
Ji te timî bi dil im
Bêî te yar bi kul im

D U R U S T
- - - - - -

Kurdistan

www.kurdishvakuri.org

ERDNÎGARIYA KURDISTANÊ

1-BAKURÎ KURDISTANÊ:

Bakurî Kurdistanê,ji bakurî welatê me re tê gotin.Di rohilata wê de ji cîranên me Yekîtiya Sowyet û Îran cîh digrin.

Bakurî Kurdistanê,herêmek herî bilind û herî bi çiya ji herêmên welatê me ye. Li vir,hem çiyayên bi serê xwe û hem jî çiyayên sererêz hene.Di nava çiyan de gol û zozanên bilind pir in.Çiyayê welatê me yê herî bilind li bakurî Kurdistanê ye. Navê wî AGIRÎ an jî ARARAT e.Bilindayiya wî 5165 mêtro ye.Dîtin û seyrkirina çiyayê Agirî pir bi heybet e.Di ciyên bilind de havîn û zivistanê jî berf heye û berfa spî xwe ji wan deran kêm nake.Çiyayê Agirî jî wek çiyayê ERCİYES ê çiyakî vemirî ye-berê volkan bûn û agir dipijiqandin, lê niha vemirîne-

Li başûrî gola Wanê,çiyayê bilind ê duwemîn çiyayê SÎPAN e.Ew jî çiyayekî vemirî ye.Li bakurî Kurdistanê hê gelek çiyayên din hene.Zozan jî li wir pir in. Zozanên ERZEROM,MÛŞ û MELETÊ zozan û çiyên herî bi fêde û bêrdar in.

Li rohilatî bakur,çiyayên Heqarî-Çolemêrghene.Çiyayê CÎLO,ku li dorhêla çolemêrgê ye, çiyayê bilind ê sêyemîn e.Berf ji ser vî çiyayî xalî nabe.



AV û ÇEM

Bi taybetî li bakurî Kurdistanê sê çemên mezin(gewre)hene.FERAT-DÎCLE-ARAS.

Ferat,ji tevlihevbûna rûbarên ava reş û ava Mûradê,tê meydanê.Paşê ji Kurdistanê derbasî Iraq û Sûriyê dibe.Li Iraqê tev li çemê Dîcle dibe û xwe bera delav-körfeza Îran dide.

Ciyê Ferêt li hinek ciyan teng dibe,kûr dibe û dikeve dirûvekî-şiklekî-bi heybet. Carna dikeve dirûvê tengavê-boxazê-û meriv ji seyrkirina wê têr nabe.Tengava Komirxanê yek ji wan tengavan e.Çemê Ferat,ji nava vê tengava bi heybet,pêl bi pêl difûre û hêdî hêdî xwe bera jêr dide.

Çemê Dîcle jî ji bakurî Kurdistanê derdikeve.Lê bi piranî cihê,ku lê diherike,rohilat û roavayî bakurî Kurdistanê ye.

www.arsivakurdi.org

Çemê Aras jî ji bakurî Kurdistanê derdikeve.Paşê dikeve nava erdê Yekîtiya Sovyet û xwe bera gola HEZAR ê dide.Bakurî Kurdistanê wek kanî û xezîne avê ye,Tê de bi her awayî av,çem,rûbar û,h.w.d(û her wekî din) hene.

G O L



Li bakurî Kurdistanê gola herî mezin gola WAN ê ye,Ev gol,gola Kurdistanê ya herî mezin e.Kûrbûna wê zêdeyî sed(100)mêtro ye. Ava wê bi xwê û bi soda ye.Ew bi xwe,wek derya-behr-yeke piçûk e,Keştî-Gemî-û kelek li ser wê dixebitin.Li der û dora wê ciyên bi bax û bexçe û ciyên gelekî xweş hene.

H E W A



Bakurî Kurdistanê herêmek gelekî sar e, Ji ber ku ciyê wê pir bilind e û bandora -tesîra-behrê lê nabe,li wir zivistan pir sar û dirêj e,

www.arsivakurdi.org

Demsala zivistanê di meha ciriya pêşîn de dest pê dike û heta meha Gulanê didome. Berf pir dikeve û her cihî digre.Ba û bager gelek caran berfê li hin ciyan kom dike.Ji vê yekê Zozan bi berfê tên girtin. Rê û ciyên bikaranînê tên xitimandin.Li hin ciyan erebe û trempêl nikarin ji ber berfê bixebitin.Encex,bi alîkariya lawiran-heywanan-meriv kare kar û barê xwe bike.

Hewa wir pir sar û ziwa ye.Ji ber vê yekê hewa wir saxlem e-bijûndar e-.Ev hewa meriv nexweş naxe.Li wir ro tîrêjan dide,lê tîrêjên royê ne germ in.

Havîna wir zû derbas dibe,germiya wê kêm e.Li ciyên bilind,havîn bi hênikî derbas dibe.Bihar pir kêm e.Zivistan xelas dibe havîn tê,an jî,havîn tê zivistan xelas dibe.Ciyên girtî û kêmbilind ne hevqasî sar e,li van ciyan havîn germ û dirêj e.Li van ciyên germ,pembo jî tê çandin.

Li bakûrî Kurdistanê berf pir dikeve. Sedema wê;ji ber,ku herêmek pir bilind e û hewa hêwî digire.Li hin ciyan baran jî pir dibare.Li ciyên,ku baran dibare,şînayî pir e.Daristana wir kêm e,ji ber,ku bi sedsalan dar û berên wan dorhêlan hatibirîn.

RÛNIŞTVAN Û DEBARA WAN

Li bakurî Kurdistanê rewşa rûniştvanan tê guhertin.Li hin ciyan rûniştvan kêm û li hin ciyan jî pir in.Ji ber sarbûn û bi çiya bûna wê herêmê,li cîna kêm kes,malbat an jî wekî din rûdinên.Li ciyên,ku germî û çandinî lê heye,meriv pir in.Rûniştvanên wan dorhêlan bi piranî bi çandinî û bi xwedîkirina heywanan dadikevin.Debara xwe bi wan dikin.Xwedîkirina heywanan li wir rolekî mezin dilîze.Li dorhêla ERZEROM û QERSÊ xwedîkirina heywanan pirtir e.Li wir bi zêdeyî Ga û Çêlek tên xwedî kirin.

Di çandiniyê de;genim,ceh,sebze,petat-kartol-pincar,pembo û her wekî din,tên bikaranîn.Li hin ciyan tirî û fêkiyên din jî digihên.Li wanderan karxane(fabrîqe) pir kêm in.Ji ber kêmbûna fabrîqan,karker jî li wan deran kêm in.Rûnîştvanên wan deran bi piranî Gundî û karkerên bejê ne.

B A J A R

Bajarên bijare yên bakurî Kurdistanê ev in: QERS,ERZEROM,EZERCAN,MELETÊ,XARPÛT,AGIRÎ,MÛŞ BİNGOL,DÊRSIM,BITLÎS,WAN,ÇOLEMÊRG-Heqarî.

Li vir dewar,mîh û bizin pir tên xwedî kirin.Goşt,şîr û eyarê van heywanan ji bo rû-

niştvanan dewlemendiyek mezin e.Li wir heywanên wek:Gur,Rovî û Hirç jî hene.



M A D E N(Dewlemendiyên ser û bin erdîn)

Li bakurî Kurdistanê madenên,ku bi kar tên,Sifir,Krom û Hesin e.Ji xeynî van madenan gelek madenên din jî tên peyda kirin.

REWŞA TÛRISTÎK



Li bakurî Kurdistanê,bi piranî ev cîhên han bala Tûrîstan dikşîne û ji alî Tûrîstîkî de xweş in:Erzerom,Meletê,Xarpût, tengava Komirxanê,Şîp-çaxlayan-û gola Tortûmê,der û dora gola Wan ê û çiyayên Agirî,Cîlo û Sîpan.



www.arsivakurdi.org

HEVIYA ZAROKÊN KURDISTAN IN

-KULÎLK-

Kulîlk vebûn sor û zerê
Nîşana şehîd li sere
Îsal vebûm bi dilxweşî
Midî milet diponijî

Ez kulîlk im ji rengê xwînê
Zarokên Kurdistan mi dixwînê
Daxwaza min giş hîn bibin
Ji bo kes nezan nemîne

Gerek em giş xebat bikin
Da em xwe serfiraz bikin
Destêb qirêj ji nav xwe derxin
Kurdistanê rizgar bikin

Da em giş pevre sûnd bixwin
Lazim îro giş şer bikin
Ger yek tenê ji me bimîne
Divê xwînê em birjînin

ŞOREŞ/bavê Ehmed



www.arsivakurdi.org

PÊKENÎN

ESLÊ KERÊ ÇIYE?

Rojekê li Berlînê(Bajarê Almanya) mûlidek tê dan,Xwediyê Mûlidê gazî du mela dike.Melak ji wan Kurd e û yek jî Tirk e. Melê Kurd ji Mûşê ye û yê Tirk jî ji Yozgatê ye.

Piştî mêvan xwarna xwe dixwun,çayê jî li ber wan rêz dikin û tev dikevin nava gotin û laqirdiyan.Ha ji vir û ha ji wir geh mêvan pirsa ji melan dikin,geh mele dua û xêr û qenciyê ji wan re dixwazin, carekê yekî mêvan destûrê dixwaze û pirsekê ji melayê Yozgatî dipirse:
-Ya seyda,ev çend mehe ku ji serê min dernakeve,gelo bi a te "eslê Kerê" çiye?..

Melayê Yozgatî destê xwe tavê je rîha xwe,tizbiya xwe dikşîne û dibêje:
-Aûzûbîlle mîna şeytanîrrecîm..bîsmîllahîrrahmanîrrahîm.Heta niha tu îspatek di derheqa eslê kerê de tuneye.Lê ji Kerê re gotine"bibe KURD" kerê qebûl nekiriye û gotiye"na,ez nabim Kurd" Îcar mumkune ku rehek Kerê û Kurda bi hevre hebe.

Çaxa ev gotin tê gotin,melayê Kurd pir aciz dibe.Zanî bû ku dijminên Kurdan

ev gotin ji ber xwe derxistine da ku pê Kurdan nebaş bikin.

Merivê,ku berê ji melayê Tirk pirsî bû, îcar ji melayê Kurd pirsî:

-Ya Seyda,gelo bi a te eslê Kerê çiye? tu çi dibêjî?

Melayê Kurd destê xwe ber bi melayê din vekir û got:

-Di eslê xwe de gotina mela Tûraneddîn di cihê xwe deye.Kerê Kurdîtî qebûl nekiriye.Ji ber ku Kerê gotiye"Eslê min û bavêmin Tirk in,ez ji eslekî esîl im,ez nabim Kurd".

BRÎNDAR



www.arsivakurd.org

KEWÊ MIN E

Kewê mine rengîn e
Pirtik sor û spî ne
Rekeha wî zêrav e
Girtiye ew li nav e
Şeng e li nav hevala
Bi deşt û kûr newala
Didê qîr û goranî
Bi sed rengî dizanî
Dengê wî dibê saz e
Şêrîn û xweş awaze
Kewê roja giran e
Deng bilûr û keman e
Li nêçîrê çeleng e
Ciwan e şox û şeng e
Lehenge ew li rava
Kewa digre li dava
Gava em tên berew mal
Jiyan dibe hemî tal
Şev û rojê xemgîn e
Dilzîz û tev brîn e
Ewî divê azadî
Bibe serbest û şadî
Fir bide li ezmanan
Biçe çiya û zozanan
Balindeye(teyr)dadikazê
Serbestiyê dixwaze

KEÇA KURD

www.arsivakurdi.org

W E Ş A N

(HACETÊN TÊGİHİŞTINÊ)



TELEWİZYON:nûçe û bûyeran hem bi deng û hem jî bi wêneyan(sûretan)diweşîne.Telewîzyon hacetek pêşketî ji yên têgihiştinê ye. Divê zarok heta derengî şevê li ber telewîzyonê nemînin.Çaxa meriv heta derengî şevê li ber telewîzyonê bimîne,hem meriv bêxew dimîne û hem jî çavên meriv xera dibin.Ji xeynî van,meriv diweste û ji taqat dikeve.Ji ber van sedeman divê zarok zû rakevin(razên)da ku zû mezin bibin û jar(zeîf)nemînin.

RADYO:Radyo,nûçe û bûyerên ku dibin,bi deng diweşîne û meriv ji wan agehdar dike.



Radyo jî wek telewîzyonê hacetek pêşketî ye.Ew bi ceryanê an jî bi pîlan dixebite.Em nûçeyên girîng yên welêt û dinê ji radyoyan fêr dibin û bi wan dihisin.Radyo ji xeynî nûçe û bûyeran,muzîk,spor,şanogerî çîrok,serpêhatî,pêkenîn û her wekî din jî diweşîne.

TELEFON:Telefon,hacetek herî girîng e. Di bajarên mezin û ciyên piçûk de,ku çûn û hatin lê pir be,rola telefonê pir mezin e.Ne tenê li bajar û ciyên din,her weha li her cihî telefon rolekî mezin ji merivan re dilîze. Meriv bi telefonê hem bi hundurê welêt re û hem jî bi derveyî welêt re kare biaxive(bipeyive).Çaxa xwedîkî meriv li ciyekî dûr be û îmkana hevdûdîtinê tunebe,meriv telefonê bi kar tîne û li hevdû dipirse.



NAME(mektûb-reşbelek):Dîroka namê pir kevn e.Di dem û dewranên berê de jî Padîşah û girgirekan bi naman hevdû agehdar dikirin û daxwazên xwe gelek caran bi naman didan zanîn.Name heta bi îro jî hatiye û rola xwe ya kevin ji bo merivên îro jî lîstiye û di mercên(şertên)îro de nûjentir(moderntir)bûye.Îro jî em bi naman li xwedî û xwedanê xwe dipirsin û saxî û nesaxiya wan fêr dibin.Name jî wek weşanên din xwedî roleke mezin e.





www.arsivakurdi.org

ROJNAME(xezete)û KOVAR(dergî):Kovar û rojname jî xwedî roleke girîng in,Em bi çar çavan li bendî derketina wan dimînin û dixwazin wan bixwînin da ku tiştekî ji wan fêr bibin.Rojname û kovar nûçe û bûyeran dinivîsînin û sûretan jî bi wan re diweşînin.Kovar û rojnamên ku derdikevin,li her cihî belav dibin û dikevin destên her kesî.

Kovar û rojname pir in,Bi her rengî û bi her cûrî kovar û rojname çap dibin û ew li gor dîtinên xwe nûçe û bûyeran belav dikin.



www.akurdi.org

Roj derket,deng bi ser gund ket,şivanan pezê xwe ajotin û Gavanan dewar derxistin çolê.Patozan genim diçinîn.Xelkê gund tev betal in,ji ber ku erdê wan nîne.Erdê gund tev ji wan stendine û dane Ereban.Ew ji dereke dûr anîne û li ser gund danîne.Çemekî xurt di wî gundî re diçe,dora wî tev bax û bîstan in.

Xelkê gund ji bo vî gundî gelek keda xwe dane.Heta ew bîstan çêkirine rebenê gundiyan ji hal de ketine.Bi mehan kevir û qûç ji nav neqandine.

Li pala girê spî,Remo ji xwe re elbek genim çandiye.Remo,gelek zehmetî bi vê çandiniyê re dît.Ne bi terektorê lê bi çot çand.Xwediyê terektorê qebûl nekir û terektora wî here ser wî erdî.Erdê Remo ji xeynî wî parçî pê ve tunebû.

Li jêr,li ber avê,Remo hinek şînayî çandiye û ketiye nava bexçe av dide.Bi dengê çûk û teyrka re helbest û strana dibêje. Bi bayê hênka sibê re ketiye xewn û xewnerojê dinyayê û ji xwe re difikire.Remo hinekî westiya(betilî-teebî).Rabû bêra xwe danî û çû li kevîka(kêleka-qiraxa)çem rûnişt,destê xwe avêt gulekê û qut kir.

Remo,gulên dora xwe bêhn kir,wê kêlîkê bayê xortaniyê li Remo xist.Ro hatibû nîvê ezman,dema xwarnê bû.Navbera gund û bexçê Remo ne dûr bû.Remo berê xwe ber bi gund vekir,carekê dît,ku Xecê tiştek daniye ser milê xwe û ber bi wî ve tê.Wî zanî bû xwarnê jê re tîne.

Gava Xecê gihişt cem Remo,silav lê kir:

-Qewetbe ji te re Remo

-Qewet li canê te be,rehmet li dê û bavê te be

Xecê çaydana çayê danî ber Remo û sêniya penêr jî danî cem û rûnişt.

-Xecê,vê kêlîkê xortanî tê bîra min,ji ber vê yekê,divê tu ramûsanekê li ber vê avê bidî min

-Mêrko,gelekî şerm(fedî)û krêt e,xelkê me bibînin li ber vî çemî.Çaxa em çûn malê min maç ke heta tu têr bibî.Rast e, em jin û mêrê hev in,lê wê milet lomê ji me bike

-Bes e keça delal,bila lomê bikin,em helalê hev in.

Remo dest avêt Xecê û devê xwe xist gerdena wê.Wê kêlîkê herdû gelek şa dibûn.

Weke dema bûk û zavatiyê bayê evîniyê li serê wan xisti bû.Herdiwa kul û derdên xwe ji bîr kirin û demeke xweş bi kêf û henek derbas kirin.

Herdûka xwarin bi hev re xwarin.Xecê şûşa çayê ji Remo re dagirt,sêniya penêr danî ber,nanê sêlê ji nava paçik derxist û li ber rêz kir.Remo nanê xwe daqurtand û firek çayê bi ser dakir û li Xecê nerî:
-Xecê,jiyana bi serbestî çiqasî xweş e.Jiyan xweş e,ku evîndarî hebe.Lê jiyana jar û bindestî gelekî nexweş e.

Dema Remo ev gotin gotin,kul û derdên Xecê yên kevin hatin bîra wê.Tada li ber destê jinbavê dihat bîra wê.Hêsrê Xecê hatin xwar,Remo bi destê xwe hêsrên wê paqij kir û beşişî:
-Çima tu di vê kêlîka xweş de digrî?divê tu bikenî ne ku bigrî.Tu bi vî halî dil dêşînî.

Herdû bi hev re dipeyivîn.Carekê dengek bi qîreqîr hate wan.Remo serê xwe bilind kir dît,ku patozek bi ser genmê wî de diçe.Mêr jî bi patozê re dimeşiyan.Remo heybetgirtî ma û ji xwe re got"gelo ev çi patoze,wê bi ku de biçe?..."

Ji xeynî parçê Remo tu dexl li wî alî tune bûn.

-Xecê,ezê herim binerim bê ji bo çi ev hatine vir

-Remo,ez nahêlim tu bi tenê herî.Bi xwedê hebe nebe ev Ereb in û hatine genmê me ji xwe re biçinin.

Remo rahişt bêra xwe û Xecê jî da pey. Bi rê de Welato dîtin.

-Tê bi kude biçî Remo?te wilo rahiştiye bêra xwe,xêr e!..

-Ezê binerim bê ev çi patoz e hatiye ser genmê min.

-Ha..ha...niha hate bîra min,ezê ji te re bêjim.Ereb çûne qeymeqam,çend nefer leşger anîne da ku erdê me yê avî ji me bistînin, erdê bejî yê bi kevir jî bibin.Heke ez ne şaş bim,ji vê pê ve tişt tune.

-Welat,here xeberê bide gund,ezê jî biçim wir.

-Remo emanetî qenciyê be,tiştekî meke.Heya gundî bên,emê paşê bifikirin.

Dema Welat giha gund û ji wan re got, kesek di gund de nema,her yekî rahişt tiştekî û berê xwe dan girê spî.

Berî gundiyan Remo gihabû patozê.Dît ku çend zilamên Ereban û çend nefer leşger bi patozê re ne.

Remo patoz sekinand.Berî ku tiştekî bibêje,trempêla qeymeqam giha wir.Di wê kêlîkê de gundî giş gihan wir.

Remo berê xwe da qeymeqam û peyivî:
-Ev çi edalete,ma ne guneh e?hûn çawa vî erdê min ji min distînin,ji dema bav û bapîran de hatiye paqijkirin û parastin...
-Tiştekî te nîne,hûn Kurd ji Tirkiyê hatine,divê hûn vegerin Tirkiyê.Hûn Kurd in, divê em nehêlin Kurd di vî warî de bijîn.
-Ev erdê min e,ez nahêlim hûn ji min bistînin.Yan ji xwîna min yan jî ji erdê min...

Wextê Remo wilo got,Qeymeqam şemaqek avêt Remo.Remo deng nekir û qedrê wî girt. Qeymeqam dengê xwe li leşgeran kir da ku patozê bajon ser genim.Gundiya çiqasî hêvî î lava kirin jî ew cardin ji ser ya xwe daneket.

Çaxa patoz xebitî,gundî giş bezyan pêşya patozê.Leşgeran her çiqasî bi dar û qayişan li wan xistin jî,lê kes nerevya.

Gundiya x2e ji ber patozê nedan alî.Qeymeqam cardin deng li leşgeran kir.Dawiyê hat dîtin ku leşger çarê ji milet nakin,hema demança xwe kişand û çend berik(fîşek)berdan da ku milet bitirse.

Pîrekên gundî pêşmalên xwe tijî xwelî (arî) kirin û avêtin ser û çavê leşgeran û Qeymeqam

Remo rahişt bêra xwe,li ber trempêla Qeymeqam sekinî û cardin got:"Ez çet nahêlim ku hûn vî dexlî biçinin,ma em ne mirovin? Kuştin ji vî halî,ji vê jînê xweştir e"

Qeymeqam aciz bû,hema demançe kire serê Remo û dîkê wê kişand

Qêrîn bi Remo ket,xwînê di dev û pozê wî re avêt der.Bi wî halî Remo li ber xwe da û got:"Ax,Heta kengî hûnê vê zilm û sîtemê li me bikin..Lê wê rojek bê ku hûnê...bi..mi...ri...n"

Destê xwe li xwînê da û bi erdê paqij kir. Xwînê rê neda ku Remo gotina xwe temam bike. Serê Remo ket ser tatîkî axê û can da.

Xecê bezya ser laşê wî,da ber qîra û got:

-Remo,îro te gelekî hej jiyanê dikir.Lê ev xwîna te wê bibe jiyana zarokên piçûk..

Hêstirên wê weke libên baranê dihatin xwar.Xecê devê xwe xist gerdena Remo û bi ser de tewiya û ma.....

x x x x x x x x x x x x x x

Ez vê çîrokê ji gelê Kurd re diyarî dikim,Ez ji xwendevanan hêvî dikim,ku tore û adetên Kurdan bi pêş de bibin,wan biparêzin û daxwaza miletê Kurd bi cî bînin

-Çiyê çîrokê roavayî Kurdistanê ye-

XEMGÎN TEMÊ

Sofîa/Bûlgarîstan

www.arsivakurdi.org

cihê vala dagirin



seet şeş.....çarîkek



seet şeş....çarîkek



seet şeş.....bîst deqîqe



seet şeş....bîst



seet şeş....bîst û pênc



seet şeş....bîst û pênc

www.arsivakurdi.org

EV HEYWAN ÇINE? ÇI DIKIN?



- - - - - - - - - -
- - - - - - - - - -



- - - - - - - - - -
- - - - - - - - - -



- - - - - - - - - -
- - - - - - - - - -



- - - - - - - - - -
- - - - - - - - - -



- - - - - - - - - -
- - - - - - - - - -

www.asivakurdi.org



"Beytar Mişko"dixwaze xwe bigihîne mêşa hingiv,Gelo bi kîjan rê wê xwe bigihînê?

Mijûlî

Herdû wêne ne weke hev in

gelo tu karî kêmasiyên wan bibînî?





www.arsivakurdi.org

XAÇEPIRS

1-Navê heywanekî

2-Navê keçekê

3-Gazî kirin

4-Navê mêrekî

5-Navê kurekî

6-Zîn

7-Zingar

8-Bangkirin

9-Tiştê ku dixin stuyê pez

10-Şer..navê kurekiye jî

11-Çêlek

12-Golkê nêr

13-Qorçik,binê zikê xênî



www.arsivakurd.org

www.arsivakurdi.org



YAN

KURDISTAN

YAN NEMAN !

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS
BIHA : 10:- skr

www.arsivakurdi.org